û li gor demê bin .

Di vî warî de , lidarxistina kongira nîştimanî ya kurd li Sûriyê di meha Tişrîna yekê sala borî de , pêwîstiyeke dîrokî bû , û çendî têbîn û rexne hebin , divê bête parastin , da em karibin bi hev re nûjen bikin .

Partiyên tevgera nîştimanî ya kurd li Sûriyê yên ku , li ser daxweza wan , ew kongireya hatibû lidarxistin , li vê dawiyê , li gor biryara kongir û civata fermî ya serkirdayetiya Encûmena nîştimanî ya kurd , biryar dabûn ku , endametiya xwe di çerçeweyên hêzên rikebir a erebî-Sûrî de bidin rawestandin û jê vekêşin , da ku partiyên kurd li hev dû vegerin û bi yekrêzî bi hev re , xwedî helwest , bi rû , û kesayetiyeke serbixwe bin , da karibin nûnertiya gelê xwe yê xêrnedî bikin . Ev gava he , divê neyê fêmkirin ku – xwedê giravî – tevgera kurd li Sûriyê berê xwe ji rikebiriya Sûriyê diguhêre , û deriyên hevkarî û pişteva niyê digel hêzên rikebir ên erebî Sûrî hatine girtin . Armanc û pêdivî ewe ku , di pey vê gavê re , rê li ber nelihevî û dubendîtî di çerçewa tevgera kurd de bête birîn , û kurd li Sûriyê di helwest û çalakiyên xwe de , ne belawela bin , û di bin kartêkirina nav û durişmên hinde hêzên rikebiriya Sûrî de , bi erzanî nebine berdevik û karmend . Li hêla dî armanc ewe ku , nûnertiya tevgera siyasî ya kurd bi navê Encûmenî nîştimanî kurd li Sûriya , çi li hundir û çi li derve , bêtir bi roleke zîrek û erênî rabe , û di berhevhatin û lihevkirina hêzên rikebiriya Sûriyê de , xwedî rol û helwesteke berpirsiyar û demokratîk be.

Beşdarên birêz …

Di Arşîf û dîroka jiyana siyasî ya Sûriyê de , li sala 1957 -an , kurd yekemîn hêzî siyasî tenha bi tenê bûn ku , partiya wan peyva demokrasiyê bi kar aniye , lê bûye xwedî , û di ber de ta nuha xebitiye… Çep û rastê ereb , çi partiya komonîst , çi Îxwan mislimîn û Be'is … hwd , peyva demokrasiyê , hevok û wateya mafên mirovan , ne di bîr û pirogramên wan de bûn , loma jî , tevgera siyasî ya kurd bi dijwarî û di heyameke zor zehmet de xebata xwe domandiye û her dê bidomîne . Bi hezaran camêr ketine zîndanan û bi deh hezaran koçber bûne , ji bilî yên ku jiyana xwe ji dest dane , hatine kuştin û di ber kurdperwerî , demokrasî û mafên mirovan de , bûne Şehîd .

Rastiya hebûna kurd li Sûriyayê bi tevgera wan a siyasî ve , duh jî û îro jî , li beramber nebûna demokrasiyê û siyaseta fermî ya rijîmên dewleta Sûriyê rikebirî bi xwe ye , û ne rikebiriyeke demsalî ye . Lewre jî , guhartineke rastî , berfireh û tevahî di rewşa Sûriyê de , daxwaz û pêwîstiyeke civakî û dîrokî ye , da ku stûn û bingehên rijîma tekpartî ji holê rabe , û Sûriyeke nû riya xwe bibîne . Eve daxwaz û berjewendiya gelê kurd e , weke çawa daxwaz û berjewendiya tevahiya xelkê Sûrî ye . Lê , pêkanîna vê guhartinê , çendî aştiyane be , ewqas kurd û ereb û hemî çûknetew û rengên dî li karê ne , lewre jî , daxwaza lezgîn ewe ku , pêşî xwînrijandin raweste , û ew sînaryoyên destêwerdana leşkerî di bin çi perdê de dibe bila bibe , ger bête holê , xwîn dê bêtir biherike , çavsorî , dijatî , kuştin , tevlihevî , talan û alozî , li seranserî herêm û civaka Sûrî , dê bêtir belav bibe . Di vê pêvajoyê de , tevgera siyasî ya kurd xwedî helwest û roleke dîrokî ye ku yekcar û yekser , rêbaza aştiyane diparêze , û şêweyên leşkerî serûber napejirîne û nabîne ku çekdarkirina xelk û kesên serhildêr , wê di xizmet pêşeroj û berjewendiya gelê Sûrî de be .

Li hêla dî , divê bête zanîn ku , taybetmendiya rewşa kurd li Sûriyê , nemaze di warê dîmografî û jihevcudabûna hersê herêman **(Çiyayên Kurdaxê – Efrîn , Kobanî , Cizîrê)** di tixûb û sînorê Sûriya – Turkiya ya navdewletî de , li dirêjahiya 910 KM , û taybetmendiya cîgehê Sûriyê li rojhilatî behra Sipî , dihêle **D. R. (10)**